# Dewlet û Mîrgehên Kurdî

## di Serdemên Navîn û Nû da



Senterê Zaxo bo Vekolînên Kurdî li Fekoltîya Zanistên Mirovayetî - Zankoya Zaxo Konferansa xwe ya Navdewletî ya 7ê dê li jêr navûnîşanê "Dewlet û Mîrgehên Kurdî di Serdemê Navîn û Nû da" li rojên 3-4/Gulana/2023 bigêrît.

**7** Heftemîn Konferansa Navdewletî

### Rênimayên Nivîsînê

1. Lîjneya zanistî ya konferansî vekolînan bi zimanên (kurdî, ʿerebî, tirkî, farisî) werdigrît.
2. Kurteya vekolînan li gel nivîsîna pênc peyvên serekî ji 500 peyvan kêmtir nebît.
3. Vekolîn ji (10.000) peyvan neborît.
4. Bo nivîsîna vekolînan ev fonte bêne bikarînan: Bo zimanên kurdî û farisî: Unicode; bo zimanê ʿerebî: Simplified Arabic; bo zimanên înglîzî, kurdîya latênî û tirkî: Times New Roman.
5. Nivîsîna vekolînan dê li dûv rêbaza (harvard) bît

### Jivanên girîng

1. Hinartina kurteya vekolînê: 1/11/2022
2. Wergirtin û redkirina kurteya vekolînan: 15/11/2022
3. Hinartina vekolînan bi şêweyekî temam: 1/2/2023
4. Haydarkirina pesendkirin an redkirina vekolînan: 1/3/2023
5. Girêdana konferansî dê li rojên 3 û 4/Gulana/2023 bît.

Zakho Centre for Kurdish Studies

(+964 (0) 751 536 1550)
hum.isc2023@uoz.edu.krd

Zakho Centre
for Kurdish Studies

## Pênaseya Giştî

Kurd milletekî niştecih ê rojhilata navîn ê kevin e û hindî ku tête zanîn her di vê erdnîgarîya niha tê da dijîn hebûne. Kurdan di dîroka xwe da gelek dewlet, mîrgeh, hukumet û xanedanên wekî avahîyên sîyasî damezrandine. Lê belê di pergala sîyasî ya bi paradîgmaya netewe-dewletên modern a sedsala 20an da teşegirtî, dîroka wan bi awayekî hejî nehatîye behskirin. Helwesta akademîya ev paradîgmaye qebûlkirî, xebatên li ser dîrok û çanda kurdan bo demekî dirêj paş existîye. Li ser binaxeyê vê hizrê, Senterê Zaxo bo Vekolînên Kurdî bi fer dît ku heftemîn konferansê xwe li dor babetê dewlet û mîrgehên kurdan ên li serdemên navîn û nû da pêk bînît da ku bi berfirehî jîyan, şaristanî û karîgerîya wan rêveberîyan derkevît meydanê.

Di serdemê Îslamî da taybetî di sedsalên 10 û 11 ên zayînî yên serdemê navîn da hinek dewletên kurdan ên wekî Rewadî, Şeddadî, Hesenweyhî, ‘Eyarî (‘Enezî), Merwanî (Dostekî) û Eyyûbî derkeftin meydanê û van rêveberîyan li Kurdistanê û derdora wê roleke mezin gêran. Piştî helweşîna hinek ji van dewletên kurdî, taybetî di serdemê dawî yê ‘Ebbasîyan da, di encama texrîbatên Moxolan hinek dewlet û mîrgehên nû li Kurdistanê hatine avakirin. Herwisa di sala 1258ê da hilweşandina xîlafeta ‘Ebbasîyan a li Bexdayê jî bû egerê peydabûna çendîn hêzên din li Kurdistanê. Hindek ji vana li ser destê malbatên xudan hejmûn bo dewlet û mîrgehên bi hêz hatine guhorîn. Digel vê çendê, gelek hozên kurd bi rengekî konfederatîfî xwe bi rêk êxistin û bûne egerê peydabûna pêkhateyên şêweyê mîrgehan ên wekî ‘eşîretên mîrî têne binavkirin.

Di vê çarçovê da, li dû vegêrana Şerefxanê Bidlîsî ya di pirtûka Şerefnameyê da, ji xanedanên kurdan di asta 5 padîşahî/melîkî, 6 dewlet û 22 mîrgehan da rêveberîyên sîyasî yên kurdî hatine damezrandin. Hindek ji wan ên wekî Bidlîs, Erdelan, Şenbo (Hekarî), Behdînan (Amêdîyê), Botan (Cizîr), Baban û Soran bûne xudanê desthelateke reha û hinekên dî jî yên wekî Xîzan, Palo, Çemîşgezek û hwd. desthelata wan di asteke nizimtir da bûn.

Ber bi sala 1501ê bi damezrandina dewleta Sefewî ve he-





wayê sîyasî hate guhorîn. Bi rastî Şah Îsmaîlê Qizilbaş muhawele kir ku rêveberên Turkuman bikete rêveberên mîrgehên kurdan, lê belê li hemberî vê bizavê tûşî berxwedaneke xurt hat. Xetereya Îranê ya li ser Enedolê, Osmanî tirsandin û li Stenbolê Sultan Selîmê soza sîyaseteke çalak dayî hate li ser textî. Sultan Selîm bi harîkarîya mîr û begên Kurdistanê, bi teserûfkirina mesrefên eskerî û lojîstîkî ve li hemberî Şah Îsmaîl serkeftin bi dest xwe ve îna. Şerê Çaldîranê yê di sala 1514an da di navbera Sefewî û Osmanîyan da rûdayî, karîgerîyeke mezin li ser paşeroja mîrgehên Kurdistanê kir. Paşê bi navgînîya Mewlana Îdrîsê Bidlîsî ve rêveberîya Kurdistanê li ser mîr û hakimên kurd ve îltîhaqî Dewleta Osmanî kirin. Li ser vê çendê, Dewleta Osmanî li herêmê di çarçova qanûna îstîmaletê da, rêveberîyên kurdan ên li ser bingehê hûqûqa mîratî/irsî (eba an cedd) ya xudanê şêweyê serbestîyeteke hinek bi selahîyeta berfireh û hinek jî nîspeten bi selahîyeta berteng, qebûl kirin.

Dewleta Osmanî ji ber tebî'etê xwe yê navendîparêz di demeke kurt da mafê mîrên kurdan ê li ser bingehê qanûna mîratî/irsî hatî dananê peyderpey bin pê kir û rêveberîyên di bin teserûfa mîrên kurdan da bi merkeza xwe ve girêda. Wisa ku merkezîbûna bi pêvajoya Tenzîmatê ve bi lez ketî, heta nîva sedsala 19an da hemî mîrgehên kurdan ji nav bir. Paşê li Kurdistanê serdema wekî retrîbalîzasyonê tête binavkirin dest pê kir. Aktorên serdema nû, bûne reîs 'eşîr, axa û şêxên terîqetan.

## Armanca Konferansê

Armanca konferansê pêşkêşkirina agahîyên derbarê dîroka giştî ya dewlet û mîrgehên kurdan ên di serdema navîn û nû da ye. Dê behsê girîngîya dewlet û mîrgehên kurdî û rola wan a sîyasî û civakî bête kirin. Dîyar e ku agahî û xebatên têr û tesel ên derbarê vî babetî da kêm in. Ji ber vê çendê, bi belgeyên nû ve rakirina mor û morana li ser mîrgehên kurdan ên li ser sînorên dewletên Osmanî û Îranê bi cih bûyî û derêxistin a dîroka serdemê tête armanckirin. Herwisa bi krîtîzekirina arşîvên Osmanî û Îranî

û kronîkên serdemê ve rohnkirina peywendîyên rêveberîyên sîyasî yên navborî yên digel van herdû dewletan jî armanceke serekî ye. Di vê çarçovê da, taybetî dê girîngî bi agahîyên ji alîyê vekolerên piştbestîyê bi belgeyên arşîvan û kronîkan dikin û bi awayekî objektîf wan agahîyan der meyan dikin, bête danê.

Xaleke din a girîng jî ew e ku xebatên li ser dewlet û mîrgehên kurdan ên heta îro hatine kirin ku bi xwe gelek kêm in, zêdebarî li ber sîya perspektîfa sîyasî rawestayî ne. ji ber vê çendê divêt bête gotin ku xebatên derbarê sosyo-ekonomîk, çandî, teolojîk, antropolojîk û etnolojîk ya mijarê kêm in. Bi vê perspektîfê ve tête hêvîkirin ku ev kêmasî bêne rakirin.

## Tewerên Konferansê

Konferansa bi navûnîşanê "Dewlet û Mîrgehên Kurdî di Serdemên Navîn û Nû da" ji çendîn teweran pêk dihêt ku di xalên jêrî hatine kurtkirin.

### A: Dîroka Sîyasî ya Dewlet û Mîrgehên Kurdî

1- Dewlet û mîrgehên kurdî yên pêşeng di serdemê navîn da: "Rewadî, Şeddadî, Hesnewî, 'Eyarî ('Enazî), Merwanî (Dostekî), Eyyûbî li Kurdistanê.

2- Peywendîyên navxeyî û derekî yên dewlet û mîrgehên kurdan.

3- Kevtin û bi dawîhatina serdemê yekê ya mîrgehan li Kurdistanê di serdemê navîn.

4- Jêderên xwandina dewlet û mîrgehên kurdan li serdemê navîn.

5- Destpêka peydabûna sîstemeke nû yê mîrgehan li Kurdistanê di sedeyên sêzde û çardeyê zayînî.

6- Mîrgehên kurdî li serdemê dewletên Qereqoyûnlû û Aqqoyûnlû di sedeyê panzdehê.

7- Mîrgehên kurdan û hevrikîya Osmanî- Sefewî di destpêka sedeyê şanzdehê.





8- Biryar û fermanên Osmanî yên taybet bi mîrgehên kurdî ve.
9- Mîrgehên kurdî di rêkkeftinên Osmanî- Îranî da.
10- Rolê mîrgehên kurdan di şerên navxeyî û derekî yên dewleta Osmanî da.
11- Peywendîyên wîlayetên Osmanî li gel mîrgehên kurdî.
12- Çaksazîyên Osmanî û karîgerîya wan li ser mîrgehên kurdî.
13- Berjewendîyên dewletên zilhêz li Kurdistanê di dest-pêka sedeyê nozde û kartêkirina wan li ser paşeroja mîrgehan.
14- Dûmahîya serdemê dûyê yê mîrgehan li Kurdistanê di sala 1851ê, eger û encam.

**B: Şaristanî, Avedanî û Rewşenbîrî**

1- Şaristanî û avedanî: Kele, medrese, rê, pire, xan, bazar û hwd.
2- Senterên zanistî li Kurdistanê di serdemên navîn û nû li jêr sîbera hukmê mîrgehên kurdî.
3- Medreseya kurdî: Weqfên wan,  rêbaz, babetên zanistî, zana.
4- Mîrên kurd û handana nivîsîn û giringîdan bi ziman û edebê kurdî.
5- Belgename û destxetên kurdî û bîyanî sebaret mîrgehên kurdan.
6- Pişikdarîya mîrên kurdan di nivîsîn, tomarkirin û danana dîwanên hozanan.

**C: Rêveberî**

1- Pêkhata rêkxistina kargêrî di dewlet û mîrgehên kurdî da di serdemê navîn.
2- Mîrgehên kurdî di sîstem û rêkxistinên kargêrî yên Osmanî da di sedeyê şanzdehê.
3- Dabeşkarîyên kargêrî di nav mîrgehên kurdî da.
4- Heremê kargêrî di mîrgehên kurdî da: Sazî û pileyên kargêrî di mîrgehên kurdî da; mîr, wezîr, ketxuda, qazî, mufti, katib, leşker û hwd.

5- Rolê mîrên kurd di birêvebirina senceq û wîlayetên Osmanî li derveyî Kurdistanê: Walî, mîrên senceqan, arpaliq, danên zeamet û tîmaran û hwd.

6- Rola mîrên kurd û leşkerê Osmanî.

**D: Aborî**

1- Jêderên aborî yên dewlet û mîrgehên kurdan.

2- Aborê gundên kurdan.

3- Samanên sîrûştî.

4- Bac û xwîk.

5- Bazirganî.

6- Pîşesazî.

**E: Jîyana Civakî**

1- Bajêr û gund.

2- ‘Eîretên kurdan, ‘eşîretên kurdan li jêr hukmê mîrgehan.

3- Hemerengîya nifşî (etnîkî) li Kurdistanê.

4- Sîyaseta mîrên kurd li hember pêkhateyên ayînî û mezhebî.

5- Jîyana ayînî û rêbazên sûfîgerîyê.

**Rênimayên Nivîsînê:**

1. Lîjneya zanistî ya konferansî vekolînan bi zimanên (kurdî, ‘erebî, tirkî, farisî) werdigrît.
2. Kurteya vekolînan li gel nivîsîna pênc peyvên serekî ji 500 peyvan kêmtir nebît.
3. Vekolîn ji (10.000) peyvan neborît.
4. Bo nivîsîna vekolînan ev fonte bêne bikarînan: Bo zimanên kurdî û farisî:







Unicode; bo zimanê 'erebî: Simplified Arabic; bo zimanên înglîzî, kurdîya latênî û tirkî: Times New Roman.

5. Nivîsîna vekolînan dê li dûv rêbaza (harvard) bît.

**Jivanên girîng:**

1- Hinartina kurteya vekolînê: 1/11/2022

2- Wergirtin û redkirina kurteya vekolînan: 15/11/2022

3- Hinartina vekolînan bi şêweyekî temam: 1/2/2023

4- Haydarkirina pesendkirin an redkirina vekolînan: 1/3/2023

5- Girêdana konferansî dê li rojên 3 û 4/Gulana/2023 bît.

**Bo peywendîkirinê:**

nameyên elektronî bo evê mailê dê bêne hinartn:

hum.isc2023@uoz.edu.krd

bo pitir pêzanînan peywendîyê bi vê hejmarê biken:

00 964 751 536 1550.

**Têbînî:**

Ji bilî mezaxtina hatinûçûnê hemî mezaxtin li ser milê konferansî ye.





## Lîjneya zanistî :

| | | | |
|---|---|---|---|
| 1. Prof.Dr. Hogir Tahir Tewfiq | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Serokê konferansî |
| 2. Asst. Prof.Dr. ʽEbdulsalam Necmedîn ʽEbdullah | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Serokê senterê Zaxo bo vekolînên kurdî |
| 3. Asst. Prof.Dr. Nizar Eyûb Hesen | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Serokê lîjneya zanistî |
| 4. Prof.Dr. Xelîl ʽElî Murad | Zanîngeha Selaheddîn | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 5. Prof.Dr. Husên Osman ʽEbdulrehman | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 6. Asst. Prof.Dr. Diyar ʽEbdulkerîm Seîd | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 7. Prof.Dr. Ferset Merî Îsmaîl | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 8. Prof. Dr. Şewket Arif Mihemed | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 9. Prof. Dr. Xizîr ʽEbas Mihemed | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 10. Prof. Dr. Xetab Îsmaîl Ehmed | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 11. Prof. Dr . Şerzad zekariya Mihemed | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 12. Asst. Prof.Dr. Lulaf Mistefa Selîm | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 13. Asst. Prof.Dr. Xesan Welîd Mistefa | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 14. Asst. Prof.Dr. Faxir Hesen Yûsif | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 15. Asst. Prof.Dr. Tariq Ahmid Şexo | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 16. Asst. Prof.Dr.Osman Abdulkerim Omer | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 17. Asst. Prof.Dr. Evin Mihemed Hesen | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 18. Asst. Prof.Dr. Mihemed ʽEbdulqadir Husên | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 19. Asst. Prof.Dr. Kameran Îbrahîm Xelîl | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 20. Asst. Prof.Dr. Heyder Leşkerî | Zanîngeha Zaxo | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 21. Dr. Ismail Şames | Zanîngeha ʽEllame Tabataî | Îran | Endam |
| 22. Dr. Hêmin ʽUmer Ehmed | Zanîngeha Soran | Herêma Kurdistanê/Iraq | Endam |
| 23. Prof. Dr. Abdurrahman Acar | Zanîngeha Dîcleyê | Tirkîye | Endam |
| 24. Asst. Prof.Dr. Sabri Ateş | Zanîngeha Southern Methodist | Tirkîye | Endam |
| 25. Asst. Prof.Dr. Fatih Gencer | Zanîngeha Mêrdîn Artûqlû | Tirkîye | Endam |
| 26. Asst. Prof.Dr. Ercan Gümüş | Zanîngeha Mêrdîn Artûqlû | Tirkîye | Endam |
| 27. Asst. Prof.Dr. Ercan Çağlayan | Zanîngeha Mûş Alparslan | Tirkîye | Endam |
| 28. Asst. Prof.Dr. Ömer Tokuş | Zanîngeha Bîngolê | Tirkîye | Endam |
| 29. Asst. Prof.Dr. Metin Atmaca | Zanîngeha Zanistên Mirovayetî ya Enqere | Tirkîye | Endam |
| 30. Asst. Prof.Dr. Fasih Dinç | Zanîngeha Mêrdîn Artûqlû | Tirkîye | Endam |
| 31. Asst. Prof.Dr. Yalçın Çakmak | Zanîngeha Mûnzûrê | Tirkîye | Endam |
| 32. Dr. Ekrem Akman | Zanîngeha Mêrdîn Artûqlû | Tirkîye | Endam |
| 33. Dr. Nevzat Keleş | Zanîngeha Bîngolê | Tirkîye | Endam |
| 34. Dr. Mehmet Rêzan Ekici | Zanîngeha Mêrdîn Artûqlû | Tirkîye | Endam |
| 35. Dr. Abdülgani Kaçar | Zanîngeha Mêrdîn Artûqlû | Tirkîye | Endam |
| 36. Dr. Yusuf Baluken | Zanîngeha Bozok a Yozgatê | Tirkîye | Endam |
| 37. Dr. Sacha Alsancakli | Zanîngeha Inalco's Eurasian Studies | Tirkîye | Endam |
| 38. Dr. Yaşar Kaplan | Zanîngeha Hakkarî | Tirkîye | Endam |
| 39. Dr. Abdusselam Ertekin | Zanîngeha Dîcle | Tirkîye | Endam |
| 40. Doktorant Cafer Açar | | Tirkîye | Endam |
| 41. Abdullah Demir | Zanîngeha Bîngolê | Tirkîye | Endam |



## Lijneya Amadekar/ Zankoya Zaxo:

| | | |
|---|---|---|
| 1. | P.h.d. Macid Mihemed Yûnis | Serok |
| 2. | P.h.d. Şivan Qasim Hesen | Endam |
| 3. | M. Xurşîd Mihemed Reşîd | Endam |
| 4. | M. Cum'e Mihemed Qadir | Endam |
| 5. | M. Warhêl Îsmaîl 'Umer | Endam |
| 6. | M. Karwan Salih Weysî | Endam |
| 7. | M. Kawan 'Umer Îsmaîl | Endam |
| 8. | M. Hejar 'Ebdullah Husên | Endam |
| 9. | M. Silêman Şefîq | Endam |
| 10. | M. 'Umer 'Ebdulrehman 'Umer | Endam |
| 11. | M. Jêhat Qadir Hesen | Endam |
| 12. | M. Wehîd Ni'met Remezan | Endam |
| 13. | M. Pale Îsa | Endam |
| 14. | M. Warhêl 'Ebdulbaqî | Endam |
| 15. | M. Cegerxwin Cemîl Emîn | Endam |
| 16. | M. Mihemed Hacî Hemîd | Endam |

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

zcks@uoz.edu.krd +964(0)751 536 1550
Iraq- Kurdistan region, Zakho- Univesity of zakho

